



HEYVA SOR A KURDISTANÊ

Alîkarî, piştgirî û bi hev re parvekirin rûmeta mirovatîyê ye.

Hejmar: 8 Sal: 2018

Li deverekê eger rihê hevkariyê tinebe, avakirina civakî kêr dimîne. Hun bi alîkariyên xwe dikarin civakê li ser piyan bigrin



Ohne Solidarität ist der Wiederaufbau einer Gesellschaft schwer. Ihre Hilfe kann eine Gesellschaft am Leben erhalten.



Heyva Sor a Kurdistanê e. V.

Wilhelmstr. 12 D-53840 Troisdorf

Tlf: 02241 / 97 52 583

Tlf: 02241 / 97 52 585

Fax: 02241 / 97 52 584

E-Mail: heyvasor@web.de

Kreissparkasse Köln

IBAN: DE 49 370 502 99 000 40 10 481

BIC / SWIFT: COKSDE 33XXX



www.heyvasor.com



Li Rojhilata Navîn şerê ku niha tê meşandin rê li ber trajedîyeke mezin ya mirovahiye vekir ye.

Ji ber vî şerî ne tenê Rojhilata Navîn, bandora xwe li gelek aliyên cîhanê kir.

Ji ber vê çendê beşek mezin mirov koşber bûne, hê jî nebûne xwedî cihe û warên ku karibin xwe parîyek nan lê bixwin. Gelek ji wan bi hêviya ku bibin xwediyê jiyaneke aram, li ser rêyên koşberiyê şerpeze û perîşan dibin. Bi hezaran ji wan li ser rêyên koşberiyê, li şûna jiyaneke rastî mirinê tên. Ji xwe karwanên koşberên ku di Derya Sipî û li ser rêyên Ewrûpayê jiyana xwe ji dest didin, vê rastiye radixe ber çavan. Ya herî xerab jî ew e ku mirov tevî vê rastiye hê jî berê xwe didin welatên koşberiyê. Li hemberî vê trajediyê erka herî bingeîn ya sazî û dezgehên mirovî ew e ku karibin pêşî li pêla koşberiyê bigrin û pêdiviyên wan kesên muhtac bicih bînin. Heta niha saziyên ku di bin navê alîkariyên mirovahî de heta kîjan radeyê ev erka xwe bicih anîne, ev yek mijara lêpirsînê ye.

Salên 90'î ji ber êriş û zîlma dewleta Tirk, li Bakurê Kurdistanê bi sed hezaran kes neçar man cih û warên xwe berdin û bibin mehkûmê jiyaneke tije kul û êş. Li hemberî van encamên giran, sala 1993'an Saziya Alîkariyê Heyva Sor a Kurdistanê weke projeyeke pêwîst hat avakirin. Tevahiya 27 salên derbasbûyî, Heyva Sor a Kurdistanê bi kar û xebatên xwe karîbû bibe hêviya kesên mexdûr û muhtaç.

Di çarçoveya xebatan de, saziya me heya niha gelek navendên tendirûstiyê û nexweşx-

ane ava kirine. Ji bo deverên ku mirov li wir mexdûr bûne, alîkariya lezgîn a derman, pêwîstiyên jiyanî û alavên dermankirinê peyda kirine.

Heyva Sor a Kurdistanê; beyî ku cûdahiyê bixe navbera netew û ramana mirovan, erka xwe a alîkariya mirovahî bicîh tîne. Di çarçoveya prensîbên alîkariya gerdûnî, destekê dide wekhevî, dostanî û aştiya mayînde. Di rewşên şer de li dijî alîgiriye ye. Ji bo bibe cihê baweriya her kesî, ti carî li gorî daxwaza aliyekî tevnegeriya ye û ferq nexiste navbera fikrên siyasî û olî. Heyva Sor a Kurdistanê, saziyeke xebata dil-dariye ye. Ti carî li gorî berjewendiyên xwe tevnagere.

Li ser vê bingehe, sala 2018'an van saziyên li jêr kar û xebatên alîkariya mirovahî yên hevbeş birêve birine:

- 1- Heyva Sor a Kurdistanê e. V. - Elmanya
- 2- Heyva Sor a Kurdistanê - Fransa
- 3- Stichting Koerdische Rode Halve Maan (Heyva Sor a Kurdistanê) – Holanda
- 4- Kurdistan Rote Halbmond Schweiz (Heyva Sor a Kurdistanê) – Siwîsre
- 5- Koerdische Rode Halve Mann VZW (Heyva Sor a Kurdistanê) – Belçîka
- 6- Kurdish Red Moon (Heyva Sor a Kurdistanê) – Inglistan
- 7- Mezzaluna Rossa Kurdistan Italia Onlus (Heyva Sor a Kurdistanê) – Îtalya
- 8- Kurdiske Røde Halvmåne Norge (Heyva Sor a Kurdistanê) – Norwêç
- 9- Kurdistan Red Moon (Heyva Sor a Kurdistanê) – Japan
- 10- Roja Sor a Kurdistanê – Awusturya
- 11- Kurdiska Röda Solen (Roja Sor a Kurdistanê) – Siwêd
- 12- Støtteforeningen Mesopotamians Sol (Roja Mezopotamya) - Danîmark
- 13- Anatolia Cultural Foundation – Kanada
- 14- Heyva Sor a Kurd - Rojava



Nirxandina sala 2018'an

Rojava û Sûrî

Ji 15'ê Adara sala 2011'an ve, xwepêşandana gel a ku bi awayekî aştiyane destpêkir, di nava demeke kurt de li tevahiya welat belav bû û ji ber destwerdana dewleta Tirk û hêzên derve veguherî şerekî navxweyî. Ji roja destpêkê ve ji ber şer, bi sed hezaran mirov jiyana xwe ji dest dan û bi milyonan jî koçber bûn.

Li gorî daneyên Rêxistina Şopandina Mafê Mirovan a navenda wê li Londonê ye, ji 15'ê Adara sala 2011'an ve;

Bi giştî 353 hezar û 935 kes hatin kuştin. Ji wan, 106 hezara û 390 sivîl in. Di nava kuştîyan de 19 û 811 zarok, û 12 hezar û 513 jin hene.

Li gorî daneyên pisporekî mijarê jî hejmara kesên di şer de jiyana xwe ji dest dane, bêtirî 500 hezar kesî ye.

Rêxistina Handicap International a Fransî jî ragihand ku di encama şer de 3 milyon kes birîbdar bûne, Milyonek û 500 hezar kes seqet mane.

Di nava 8 salên derbasbûyî de ji 23 mîlyon welatîyên Sûrî, 11 mîlyon kes ji cih û warên xwe bûne.

6 mîlyon ku ji wan 2 mîlyon û 800 hezar zarok in, koçberî welatên cîhanê bûne. 5 mîlyon û 400 hezar kes jî neçar mane ku birevin.

Efrîn

Efrîn ku piraniya şênîyên wê Kurd, yek ji bajarên herî aram û ewle li Rojava bû. Tevî derfetên xwe ên kêrhatî, Efrîn himbêza xwe ji bo sed hezaran koçberên Sûrî re vekir û xwedî li wan derket. Bajarê Efrînê ku beriya şer hejmarê şênîyên wê 400 hezar bû, di nava 2 salan de ev hejmar gihîştê mîlyonekî.

Tevî hemû zor û zehmetîyan jî, hemû pêkhatîyên li Efrînê bûn xwedî jiyaneke hevpar û aram. Di van rojên ku mirovahî li benda bidawîbûna şer û aloziyan bû, dewleta Tirk û çeteyên wê di 20'ê Çile'yê 2018'de bi armanca dagirkirin û herêm bi temamî ji sivilan were valakirin bi hev re êrişî Efrînê kirin.

Dewleta Tirk û çeteyên wê ne exlaq û ne jî pîvanên şer nas dikin. Li Efrînê jin, zarok, kal û pîr jî di navê de sivilan kirin hedef. Bi bombekirina deverên sivilan ewlehiya can û malên sivilan hate tinekirin. Xanî, avahî, mizgeft, nexweşxane, bendav, kampên penabaran alîyê dewlata tirk ve hate hedef girtin bombebaran kirin, hemû

mal û mûlkên welatîyên Efrînê tê dizîn û talan kirin. Di nava 2 mehan de ji nav de zarok, jin û kal bêtirî 500 kesên sivîl ketlîkirin û bêtirî 1000 kes jî birindar kirin. Ji ber dagirkirina Efrînê sed hezaran welatîyên Efrînê ber êrişên hovane neçar man û koçber bun û niha li hêrama şebayê de di bin şert û mercên dijwar de dijîn. Dewlata Tirk, bi sed hezaran xelkê Efrînê koçber kir û li şûna wan çete bicihkir, demografiyê diguherîne û di serî de zeytûn, hemê xêr û bêrên bajêr talan dike.



Bakurê Kurdistanê

16 Tebaxa 2015'an dewleta Tirk dijî Bakurê Kurdistanê dest bi pêvajoya qedexekirina derketinê kir. Di nava demeke kurt de ev pêkanîn li Ferqîn, Lice, Silopî, Sûr, Cizîr, Nisêbîn, Dêrik, Kerboran, Hezex, Gever û Şirnex belav bû. Bi ragihandina qedexeya derketinê, êrişa hêzên Tirk li van deveran zêde bû. Di encamê de gelek ji wan jin û zarok, bi sedan mirov hatin kuştin. Her wiha ji ber êrişa bi tank û topan bi hezaran malên Kurdan hatin rûxandin.

Li gorî rapora navenda dokumantasyonê a Weqfa Mafê Mirovan li Tirkîyê (TÎHV), ji 16'ê Tebaxa 2015'an heya 1ê Cotmeha 2018'an li Bakurê Kurdistanê 11 Bajar

û 50 Navçeyan de 332 caran derketîna kolanan hatine qedexekirin. Di raporê de qedexaya kolanan li gorî bajaran wiha te destnîşan kirin.

“Li Amedê 190, li Şîrnexê 13, li Mêrdînê 53, li Colemêrgê 23, li Mûşê 7, li Bedlîsê 18, li Çewlîgê 7, li Xerpêtê 2, li Dêrsîmê 6 û li Êlihê 6 caran bi awayekî fermî derketina kolanan li welatîyan hatine qedexekirin”.

Siyaseta hilweşandinê ya dewleta Tirk sala 2018’an jî di bin navê veguherandina bajêrvaniyê de dewam kir. Her wiha deh hezaran kes hatin girtin û deh hezaran xebatkar ji karê xwe hatin derxistin. Ji ber van kiryarên dewlata tirk, sed hezaran kes nava hêjarîyê de ne û ji bo jiyanê hewcetîya wan alîkariyê heye.

Başûrê Kurdistanê û Iraq

- Ji ber nakokiyên di navbera rêveberiya Iraq û Herêma Başûrê Kurdistanê de li gelek deveran aloziya jiyanê xwe da der. Ji ber şer û êrişan, ji deverên Xûrmatû, Xaneqîn, Kerkûk, Daqoq, Taze, Beşîr, Mexmur, û Rabîa bi deh hezaran kes ji warên xwe bûn û niha li kampên penaberan di nava şertên giran de dimînin.

- Dewlata tirk a dagirker dijî xaqa Başûrê Kurdistanê di sala 2018’an jî bi armanca dagirkerîyê erîşên xwe kir. Bi taybet erîşên hewayî de gelek kesên sîvîl hatin qetîkirin û xanî, avahî, bax û baxçên wan hatin xêrabkirin.



- Di 26’ê Cotmeha 2018’an ji ber barana zêde li binarê Qendîl lehî çêbû. Ji ber lehiyê; 12 pîr rûxîyan, rêya 27 gundan û ava 15 gundan qut bû. Elek-trîka giştî a van her sê hereman qut bû.

3 navendên tendurîstîyê, 3 mizgeft û 2 dibistan jî rûxîyan. Zerareke mezin gihişt milk, dikan, erebe, baxçe, cokên avê, ajal û mêşhingivan. Heman demê de bi dehan mal jî wêran bûn.

- Li bajarê Şengalê jî ku 3 Tebaxa 2014’an ji aliyê çeteyên DAİŞ’ê ve hatibû dagirkirin, hê şopên şer û wêraniyê li ber çavan e. Her çendî beşek ji xelkê Şengalê vegeriya warê xwe jî, lê hejmara zêde hê di nava şertên giran de dimîne. Gelek ji Şengalî jî ber ku xaniyên wan hatin rûxandin nikarin vegerin.

Rojhilatê Kurdistanê

Di 12'ê Mijdara 2017'an de jî erdhejek bi şîdeta 7.3 li Kirmaşan û Serpêla Zehawê pêkhatibû. Di encamê de zêdeyî hezar û 700 kesan jiyana xwe jidestdan û nêzikê 10 hezar kes jî birîndar bibûn. Heya niha jî hejmarek mezin ji mexdûrên wê erdehejê di bin konan de dijîn û heya niha jî dewleta Îranê nekariye pêwîstiyên wan pêk bîne. Li heman herê de di 25'ê Mijdara 2018'an dîsa erdhejek mezin çê bû û nezî 800 kes birîndar bû û her wiha gelek avahî hilweşîyan.

Rejîma Îranê di sala 2018'an de jî bi dehan kolber ên ku navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê ji bo debara xwe bazirganîyê dikin, qetilkir. Her wiha amborgaya li ser îranê û krîza aborîyê bandora xwe herî zedê Rojhilatê Kurdistanê dike û ji ber vê sed hezaran malbat di nava hêjariyê de ne û muhtacê alîkariyê bû ne.

PROJEYÊN ME

I - PROJEYA ALÎKARIYA LEZGÎN:

Ev proje ji bo kesên ji ber şer, bûyerên xwezayî û rewşên awarte mexdûr dibin, tê birêve birin. Di çarçoveya vê projeyê de pêdiviyên jiyanî wek xwarîn, derman, kinc û hwd. ên kesên mexdûr tê bicîhanin.



ŞEHBA

1- Di meha sîbatê de ji bo gelê Efrînê yên ku bin erîşên dewlata tirk û çeteyên wê de bû **250 hezar euro** alîkariya madî hate şandin. Ev alîkarî ji bo peydakirina derman, alavên tenduristîyê û cîhazên nexweşxaneyan hate bikaranîn.

2- Di piştî dagirkirina Efrînê û koçberbûna sed hezaran Efrînîyan, di meha Nîsan, Gûlan û Hezîranê de ji Elmanyayê bi giştî **690 hezar euro** alîkariya madî hate şandin. Vê alîkariya madî ve jî ji bo koçberan pakêtên xwarinê, alavên paqijiyê, pêdiviyên jîyanê û hrw. hate peydakirin.

3- Ji Îtalyayê Heyva Sor a Kurdistanê di sala 2018'an de bi pişgiriya UPP, SiAmo Afrin, GUS (Human Solidarity Group) û M.înternasyonel ve bi giştî, **260 hezar 964 euro** alîkariya madî ji bo efrînîyên li herêma Şehbayê şand.

4- Ji Fransayê Heyva Sor a Kurdistanê **30 hezar euro** alîkariya madî ji bo Efrînîyên li herêma Şehbayê şand.

5- Meha Îlonê, ji bo penaberên Kampa Laviron a li paytexta Yewnanîstanê Atînayê, bi buhayê **10 hezar Euro** alîkariya pêdiviyên jîyanî hat şandin.



6- Ji bo malbatên mexdûr en ku li deverên Bakurê Kurdistanê yên di encama erîşên dewleta Tirk de wêran bûn, di sala 2018'an de bi giştî **650 hezar euro û 100 hezar dolarên Amerîkî** alîkarî hat şandin.

7- Ji bo mexdûrên lehîyê a ku di 26'ê Cotmeha 2018'an de li binarê Qendîlê çê bibû, **200 hezar Euro** alîkariya madî bi tevî şandeyekê hate şandin.

8- Di meha Kanûnê de ji bo koçberên efrînê yên ku li herêma Şehbayê ne, **300 hezar Euro** alîkariya madî hate şandin. Bi vê alîkariya ve pêdiviyên zivistanê wek betanî, sobe, binrax û hrw hate peydakirin.

II- PROJEYA ÇÊKIRINA XANÎYAN JI BO MALBATÊN MEXDÛR ÊN LI ŞIRNEXÊ

Li Şirnexê ji ber wêrankariya dewleta Tirk bi hezaran malbat bê cih û war man. Heyva Sor destpêka sala 2017'an ev proje da destpêkirin. Armanc jî vê projeyê ewe ku ji bo van malbatên mexdûr xanî werin çêkirin.

Di çarçoveya projeyê de xaniyên werin avakirin wê navbera 60 m2 - 80 m2 bin û jî 2 ode, mutfak, Banyo û WC pêk werin.

Di sala 2018'an de li Şirnexê avakirina 118 xaniyan hate destpêkirin û ji bo van xaniyan bi giştî **300 hezar Euro** û ji Swîsreyê jî **40 hezar Frank** hate şandin.



III- PROJEYA MALBATÊN XWIŞK û BIRA

Yek ji xebatên girîng ên Heyva Sor a Kurdistanê, projeya Malbatên Xwişk û Bira ye. Armanc ji vê projeyê bicihanina pêwsîtiyên malbatên mexdûr û desteka psîkolojîk e. Bi vê projeyê de di navbera malbatên bê kes û malbatên alîkar de, pêwendiya xwişk û biratiyê hat pêşxistin û alîkarî hat kirin.

Her çendî di encama zextên dewleta Tirk de hin pirsgrêk derketibin jî, lê piraniya alîkariyên malbatên derveyî welat gihiştî kesên mexdûr. Şertê Projeya ku mehane 150 Euro tê şandin, divê saleke dewam bike.

Di sala 2018'an de **559** malbatên mexdûr ji vê projeyê de alîkarî girtin.

Encama vê projeya ku Sibata 2016'an destpêkir heya niha **5505** malbatên mexdûr alîkarî wergirtin û ev malbatana jî li gorî bajaran wiha ye:

CIZÎR: 1111, HEZEX : 291, SÛR : 758, SILOPÎ: 316, NISÊBÎN: 1045, GEVER : 539, ŞIRNEX: 1416, QILEBAN: 4, KERBORAN: 1, DÊRIK : 1, ELKÊ : 8, ÇELÊ : 1, WAN: 7, AMED: 8, ÊLIH: 2, FERQÎN:1

IV – PROJEYA FITRE, ZEKAT Û QURBANÊ

1- Bi wesîleya Meha Remezanê, ji bo xelkên Sûr, Cizîr, Şîrnex, Nisêbîn û Geverê bi bihayê **200 hezar Euro** pakêtên xwarînê hatin standin û bi rêya meclisên gel li malbatên muhtac hatin belavkirin.

2- Ji bo xelkê Efrînê yên ku li hêrama şehbayê ne, meha Remezanê bi bihayê **60 hezar Euro** pakêtên xwarînê hatin belavkirin.

3- Bi wesîleya Cejna Qurbanê,

-bi bihayê **150 hezar Euro** qurban ji Efrîniyên li herêma Şehbayê re,

-bi bihayê **150 hezar Euro** qurban ji xelkê Sûr, Cizîr, Şîrnex, Nisêbin, Gever, Silopî, Hezex û deverên din li Bakûrê Kurdistanê re,

-bi bihayê **50 hezar Euro** qurban ji mexdûrên erdhejê yên li Kirmaşan û Serpêla Zehawê re,

-bi bihayê **50 hezar Euro** qurban ji Mexdûrên şer yên li Tûzxûrmatû û Daqûqê re, bi gîştî **400 hezar Euro** alîkariya qurbanê hate şandin.



V- PROJEYA ZAROKAN

Li her devera cîhanê ji ber şer, herî zêde zerar li zarokan tê kirin.

Bi armaca dermankirina birînên zarokên ku bûne mexdûrên şer û bê xwedî mane, Heyva Sor a Kurdistanê ji roja hatiye avakirin, destê alîkariyê dirêj dike. Li gorî

pêwîstiyên vê projeyê, heta zarok mezin bibin û bibin xwedî hêza xwe debarekirinê, alîkariya bi wan re dewam dike.

Li gorî Rapora Fona Alîkariya bo Zarokan re a Neteweyên Yekbûyî-UNICEF' ji 4'an yek zarokên li cîhanê bûne mexdûrên şer û aloziyan. Li welatên xwedî alozî 535 mîlyon zarok ji xizmetên jiyânî û tendirûstiyê bê par mane. Li gorî lêkolînên UNICEF û rêxistinên civaka sivîl bêtirî 140 mîlyon zarok ji ber şer û afetên xwezayî bê malbat mane. Ev zarok weke bê wedî û sêwî jiyana xwe dewam dikin.

Li Kurdistanê jî, ji ber şer û êrişan, bi deh hezaran zarok sêwî mane.

Di çarçoveya projeya zarokan de, sala 2018'an:

1- Ji bo 150 zarokên li Başûr Kurdistanê yên bûne mexdûrê şer û êrişan **60 hezar Euro** alîkariya madî hat şandin.

2- Ji bo 402 zarokên Bakurê Kurdistanê yên bûne mexdûrê şer û êrişan **390 hezar 230 Euro** alîkariya madî hat şandin.

3- Ji Swîsreyê, ji Weqfa Zarokan a li Bakurê Kurdistanê re di çarçoveya pişgirîya perwerdê de ji bo 50 zarokan di sala 2018'an de **7 hezar 860 Frank** hate şandin.

VI - PROJEYA TENDIRÛSTIYÊ

Armanca vê projeyê; ji bo kesên ku xizmeta tendirûstiyêde bê par mane re kirina alîkariya tendirûstiyê ye. Di çarçoveya vê proje de, saziya me li herêmên şer an jî herêmên xîzan de nexweşxaneyan ava dikin. Her wiha dermanan, ambulansan, cî-hazên medîkal peyda dikin û mesrefên tedawî yên kesên hêjar didin.



1- Sala 2018'an di encama serlêdanên mexdûrên şer de, ji bo dermankirin û peydakirina pêwîstiyên tendirûstiyê, saziya me bi buhayê **98 hezar 330 Euro** alîkarî şandiye. Bi van pereyan, mirov hatin dermankirin, mesrefên nexweşxaneyan hatin peydakirin û ji bo kesên kêr endam re, protez hatin kirin.

2- Di çarçoveya Projeya Tendirûstiyê ya ji bo Rojava de, li bajarê Til Temirê ji Cotmeha 2016'an de avakirina nexweşxaneyekê hatibû destpêkirin. Ev nexweşxane di 5'ê Nîsana 2018'de hate vekirin û niha xizmeta gel de ye. Heyva Sor a Kurdistanê ji bo avakirina vê nexweşxaneyê bi gîştî **145 hezar euro** alîkarî şand.

3- Ji Îtalyayê bi hevkarîya saziya Steffatta Sanitaria di çarçoveya projeya tenduristiyê de 2 caran bi bihayê **300 hezar euro'yî gîştî 800 kilo** hacetên tenduristiyê û derman ji Rojava re hate şandin.

4- Di çalakiyên Kurdistanîyên li Ewrûpayê, xizmetên tendirûstiyê hatin kirin.

VII - PROJEYA PIŞTGIRIYA DAYIKÊN AŞTIYÊ

Li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê ji bo şer bi dawî bibe, Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê bi



salan e dixebite. Ji bo piştgiriya xebatên wan, Heyva Sor a Kurdistanê sala 2018'an 7980 Euro alîkariya madî da Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê

VIII - PROJEYA PIŞTGIRIYA BI GIRTİYÊN NEXWEŞ RE

Armanç ji vê projeyê ew e ku kesên nexweş di zindanên Tirkîyê de di nava şertên giran de dimînin û derfetên wan ên tedawîyê nînin, alîkariya madî were şandin.

Di çarçoveya vê projeyê de, Heyva Sor a Kurdistanê, di sala 2018'an de **8200 Euro** ji bo girtiyên nexweş alîkari şandî ye.

KAMPANYA ENDAMTIYÊ YA HEYVA SOR A KURDISTANÊ

Saziyên alîkariyê bi zêdebûna hijmara endaman xwe ve dikare destê alîkariyê dirêjî hîn bêhtir kesên mexdûr bike. Saziyên alîkariyê bi hijmara endaman xwe ve wê bizanibin ku mehane çi qas dahatên wan çê dibin û li gorî wê jî wê bikaribin plansazîya projeyên alîkariyê yên demdirêj çê bikin.

Her wiha zêdebûna hijmara endaman ji saziya alîkariyê re rêya têkiliyan bi saziyên navnetewî û dezgehên fermî re jî vedike û di çêkirina projeyên hevpar de bandoreke erênî dike.

Li gelemperiya cîhanê ji ber êrişan, şerê navxweyî, felaketên xwezayî, xizanî û nexweşîyan, bi mîlyonan mirov ji bo li ser piya bimînin, liberxwe didin. Saziya alîkariyê Heyva Sor a Kurdistanê ya ku bi armanca peydakirina pêwîstiyên jiyandî yên kesên mexdûr hate avakirin, 27 salin bê navber xebatên xwe ên alîkariya mirovahî dewam dike û tevahiya van salên derbasbûyî, Heyva Sor a Kurdistanê bi kar û xebatên xwe karîbû bibe hêviya kesên mexdûr û muhtac.

Ji bo wê hêviya Heyva Sor a Kurdistanê ev ku ji her malekê de herî kêrkesek bibe endamê saziyê û li gorî dilê xwe rêkûpêk mehanîya xwe bide.

Kesên dixwazên bibin endam, dikarin forma endamtîyê dagrin û bigihînin Heyva Sor a Kurdistanê. Forma endamtîyê li cem xebatkarê saziya me û her wiha li ser navnîşana înternetê www.heyvasor.com/ku/endamti heye.







EFRÎN